

SAL 3
HEJMAR 22

SEMBİ

KANUNA-PAŞİN 1944

RONAHİ

ANNÉE 3
NUMÉRO 22

SAMEDI

1 JANVIER 1944

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR

TELEFON: 12—29

QEZAQINE RÜSI



Qezaqen rüsi siwariyine giran in. Ev siwariyên ha hetanî îro carina bi rimhan dirêji dijiminan dîkin û bera wan didin. Klîşa me dido ji wan qezaqan şanî dide.

ÇAPXANA TEREQIYÊ
SAM — 1944

DI VĒ HEJMARĒ DE

Çûk û Pîrê	Çirokbêj
Sewilê Sofî	Çirokbêj
Di vî Şeri de	Nêrevan
Cebraîl	Qadirê Ferman
Ji Edebiyata Farisi	Farisixwin
Napolyon	Osman Sebri
Mêrîk û Dîn e	Xelîl Genco
Çin	Dr. Loynel Caylez
Jinan Kêmxwarin	Pirbêj
Hindik Rîndik	Xeberghêz
Nêçireke Pîlingen	Dilawer Çarpine
Skoçland	Ronahî
Masiyê Braşti	Efsanbêj

ÇÛK Û PÎRÊ

Dibéjin ko pîrek hebû, çû ser tenûrê da ko nan lêxel, pif kire agirê tenûrê, agir pê ne ket. Di gava çûkek hat û got-ê: « Pîrê heke agirê te pênamevê, stirik di lingê min de heye, derêxe û degne ser çavê égir, we pékevê ». Pîrê stiri ji lingê çûkê derêxist û dani ser égir, agir pékel. Pîrê nanê xwe lêxist, çûk ber bi wê ve hat û got: « Ez stiriyê xwe dixwazim ». Pîrê gote çûkê: « Ezê ji te re piştî stiri û qîrz bñim » Çûkê go: « Na xwe ez heft nan dixwazin ji bedêla stiriyê xwe ».

Pîrê heft nan dane çûkê. Çûk nanê xwe bir û çû. Dî, gava şivanek koda şir li ber e, û bê nan dixwê, ji ber ko bi wi re nan ne bû. Vêca çûkê gote şivan: « Kuro, bi min re heft nan hene, cirnek paqî bike emê vî nani té de hûr bikin û şir bêxin ser û emê bi hev re bixwin. Şivan rabû weke çûk got-ê kir û bi hev re xwarin. Piştî ko xwarin çûk gote şivén: « Min heqê nanê xwe divê » Şivén go: « Ma te çi divê? » Çûk got: « Min heft beran û berzek divê, heqê nanê min ». Dawî şivén heft beran û berzek dane çûk.

Çûk ew birin û çû, heta giha gundeki, di daveteke li wê derê heye. Lê ji bo dawetê dik û mîriyîk digurandin, neperûşkê şér. Vêca çûk gote wan: « Ezê heft beran û berzekki bidime we tiştine holê hûrik megurînin, şerm e ». Vêca rabûn her heft beran û berx gurandin. Piştî ko gurandin çûk go: « Min heqê wa divê ». Gotin wi « Ne te dane me ji bo ko em ji dawetê re bigurînin, ji bo çi em heq bidin te ».

Tali çûk, bûk ji nav lepê wa revand û bi çolê de çû. Gava dî şivanek wi li wê derê ye,

ÇIROKA KURDMANCI:

SEWİLË SOFÎ

Sofik hebû; sewilê xwe bir û çû serê kaniyê, da ko destmêj bigirê. Vêca sewilê xwe danî bin latekê û çû ko destê xwe biço. Vegerîha cem sewilê xwe, dî lat bi ser sewilê wi de ketiye, sewil şikestiye. Sofî gote latê: Çima te sewilê min şikand?

Latê go: na xwe, çima giya di bin min de şin dibe?

Sofî gote giyê: Ji bo çi tu di bin latê de şin dibi.

Giyê go: na xwe, ji bo çi pez min dixwin?

Sofî gote peza: ji bo çi hon giyê dixwin?

Peza go: na xwe ji bo çi gur têne me?

Sofî gote gura: çima hon têne peza?

Gura go: na xwe çima se têne me?

Sofî gote sa: çima hon têne gur?

Seya go: çima kebanî me têr nan nakin?

Kebaniya go: naxwe, çima mişk hebanê me qul dikin?

Sofî gote mişka: çima hon hevana qul dikin?

Mişka go: na xwe, çima kitik têne me?

Sofî gote kitika: çima hon mişka dikujin?

Kitika go: em mişka dikujin û dora mala xwe de çiva didine xwe.

Sofî dev ji van berda û perçeyê sewilê xwe dane hev.

çûk gote şivén: « Bilûra xwe nadî min, ezê vê bûkê bidime te? » Şivén go: « Belê » û bilûr da yê û bûka xwe bir.

Çûk rahişte bilûrê û çû serê latekê sekintî û go: « Çiri, wîrl, min stirik da bi heft nan, û qurseki da bi heft beran û berzek, û min heft beran û berzek da bi bûkekê, û min bûk da bi bilûrekê û tall ez li ser latekê û kes nîne serê min hûr kê.

Şivén rahişte kevireki û li serê çûk da şikest; çûk mir. Şivan bilûra xwe jê vegerand,

DI VI ŞERİ DE XEBATA JINÉN SOVYÉTISTANÉ

Jinén Sovyétistané di vi şerî de xebateke zor dixebeitin. Kovar û rojname hero qala qeh-remaniya jinén Sovyétistané dikin.

Heval Evdirezman Siltanof, sekretérê sefreta Sovyétistané ya Misirê ji kovareke Misirê re qala xebata jinén welatên ûris kiriye û gotiye:

Ürla ji vi şerî re şerî ûrîl dibejin. Herkes jin û mér, kal û ciwan hemî pardariya vê cihadê dikin. Herweki hon dizanîn elemanan bajarén me xerab kirine. Ji avakirina wan re jin ji mérâna bêtir dixebeitin. Pişti xelaskirina Stalingradê komek jin çû bûn-ê. Xelkê gote wan, hon hatine çi, ma hon nabînîn ko di bajer de avahiyek ne maye ko hon bikarin tê de rûnin.

Jinan li wan vegerand û got: Em ne ji bo rûniştinê lê ji bo avakirinê hatine.

Gava ji hikmet an ji fabrikeke re peya divîtin jin di ser mérâna re dirigin. Ji ber ko ew di xebatê de bikérhatftir in.

Ji milê din jin xweyîyên her heqê civakfû siyast ne. Dibin qazî, diktör, evkat, seffî, mamoste, nimnende h. p...

Bivê nevê tête bîrê, jinén ko di hikmet an di fabrikân de dixebeitin gava zaro dîfînîn ci dikin. Hikmetê jê re tevdîfrêne gerek dîfîne. Ji jina avis re berî zayfînê bi mehekê rixset didin. Pişti zayfînê ji meheke din rixseta wê heye. Di van her du mehan de jinik li mal rûndî lê miaşê xwe bi temamî dibe.

Heke jinikê tu kesê wê nîne ko li zaro miqate bibe jinikê hero sibê gava diçe xebata xwe zarokê xwe dibe « mala zarokan » û li wê derê dihîle. Mala zarokan teşkîlateke hikumetê ye. Evarê gava ji xebatê vedigere mal zarokê xwe bi xwe re dîfîne. Heta ko zarok dibe bi salekê an bi sal û nfvekê; yanî hetanî ko ji şîr tête vekirin. Ji hingê û pê ve jinik zarokê xwe dibe « Bexçê zarokan ». Ev ji teşkîlateke hikumetê ye. Zaro tê de bi hevûdin re dileyizin.

Di ziwacê de mér xwediye malê ye û debar li ser wî ye. Kêm caran jin ji mérê xwe tête berdan. Lé heke hate berdan zaro bi dê re dimfîn û ji miaşê mérîk seyekî ji bo nefeqê tête birîn.

Heç jinén ko şes zaro hene hikmet ji wan re miaşekî xweser dide û jin vi miaşî heta mirinê dibin. Yen ko hevalcewan dîfînîn ji wan re ji aliye hikumetê û ji aliye ehalîyan mikafatek heye »

EVDIREHMAN SILTANOF

CEBRAÎL NEMERD Û DEXSOK

Li wezît berê du mirovîn kêm hebûn, bû bûn hevalên hev; yekî nemerd, yekî dexsok. È nemerd ewçend timakar bû ko ne dixwar ne ji vedixmar hema dida hev. È dexsok ji ji qencîya ko digihaşte xelkê ewçend algehirî ko dikir bilmire

Rojeke Havûnê her du heval li çolê bi rê ve diçün; rasti pireki hatin. Wî pîrî hevalîl bi wan re kir heta ko gîhaştine serê dariyanekê. Pîr sekini û got: Ez Cebraîl im, di hire de ez dikim ji we vegetim. Min diwê ez gençkê bi we bikim. fcar billa yek ji we ji min tîşteki bîxwazit, eşe wi tişti bidim-ê, û ji wi re ko tîştek ne xwestîye duqatê tîşte ko hevalê wi xwestîye bidim.

È timakar di dîlê xwe de digot: « Ez dizanîm jê tîşteki mezîn bîxwazim. Lé bîla berî ewwill hevalde win bîxwazit da ko ez bikarim jê du caran bêtir bistînîm ».

È dexsok diqot: « Heke min jê tîştek xwest duqatê wi bîgehe hevalê min ».



Tangine Emîrikanî Berdane Tangine Elemanî û Ew Xerab Kirine.

Bi vt awayî her diwan ji qîwa xwe ne tant beriya û din daxwaza xwe eşkere bikin. Midekti ker û lal sekînîn. Davî û timakar, yê ko ji hevalê xwe xurtrî bû, rabû li hevalê xwe xist û got-ê: « Kuro bistexile, ev fîrsendek e, tu dikarı dewlemend bîbî ».

È dexsok gote hevalê xwe; Baş e,

ezé bistexilelim, lê ez ditîrisim tiwê li dawîyê poşman bîbî. Ü berê xwe da Cebraîl û got-ê: « Bîla çaveklî min kor bîbî ».

Cebraîl li ser gotina xwe sekînî, dexsok bi çavekî hişt û è timakar ji her du çavan kor kîr.

QADIRÊ FERMAN

JI EDEBIYATA FARISI

— Ji seydayê delal
Mirza Evdilhadi re —

Seyda!

Te berê xwe da oôurê, piştî xwe da felekê; te
gesta mala Xwedê kir.

Ôkura te li xérê bit. Xwedê te bi selamet
bigehine Mekê, bi kum û destmala xwe a
gir, li Erefatê li ber berê res bisekinî.
Yezdan te bi saxî û xweşî vegerinî mal.
Em ji te re bibêjin tu bi xér hatî seyda
haci Evdihadi.

Li Şanî te ji min re goti bû, te carekê tiştin
ji edebiyata farisi tercime kiri bûn; ew geleg
spehî bûn. Çire hergav tiştine farisi ji me re
tercime naki?

Ji bo bicihanîna daxwaza te, ve ne min tiştine
farisi wergerandine kurdimaneiyê. Xwedê
bikit tu bi wan kefxwes bibî.

—[JI GULISTANA SADIYÊ ŞIRAZI]—

TEHLİK

Yek hebû çavê wî têsiha. Çû nik beytaref
ki û got-ê, miû derman bike. Beytar ji dermanê
ko dikir çavên carpeyan di çavê wî kir. Mêrik
kor bû; çû şerfetê. Qazî got: Tu sùcê beytar
nîne; mîrik bi xwe ker ne biwa ne diçû balê.

Mexsed ji vê gotinê ew e ko heke mirov
karine mezîn siparte mirovén neceribandî dawî
poşmanî ye. Cem eqilmandan mirovine welê
eqilsivik têne hesêb.

Ma kengê eqilmend karine mezîn dispêre
pespayan.

Yêñ ko hesfrê çedikin ma kengê dizamin
di karxana hevrîsim de bixebeitin.

[JI DÎWANA HAFIZÊ ŞIRAZI]


Ey mirovén xudandîl û dilovan, dilê min ji
dest diçit. Ez bi vi derdi derdemend im ko, pê re
tiştîn ko di dilê min de veşarî ne ew wê eıkere
[bibin.

Em di keştiyê de riunişti ne, ey ba bide xwe
û keştiya me bajo. Hege ko cardî em rüyê nasê
[xwe bibinin.

Ey deh rojîn ko em di dingayê de dibortnîn
ne lu tişî in; hemi çîrok û efsane ne. Guh bide
û vî wextê kurt ji qenciyâ dost û yaran re
[firsendekê bijmérine.

Şevîdi, di civata gul û şerabê de bilbil ci xweş
dixwend û digol: Şeraba spêde binin, hon ji
[şerabxwirino werin, lê bigehin hep.

Li neynika Skender binêre, ew peyaleke şerabê
[ye. Ew ji te re halê milkê Dara şanî dide.



DÜKA KENTÊ DIGEL KEÇ Ü KURÊ XWE

Ey xudan ihsan û keramet, ji bo şikirdariya
selamela xwe, carekê li derwêşê feğir bi xweşî
[û qenciyê çav dêr.

Bistehiya her du dîyan (dîyan û arixet) di
van her du gotinan de ye: Bi dostan re xweşî,
[blî dijiminan re midara.

Di tanga çaknaviyê de rô ne dane me. Heke te
[ev ne eciband, were qeza û qedere biguhêrine.

Ew tiştî tehîl (şerab) ko sofî navî wi kirîye
diya rebastan, ew li nik me ji maçkîrina
[hinarikên keçikan şîrîntir e.

Di hegymen lengiyê de xwe bide mestî û ve
xwarinê. Ji ber ko ev kimyaya hestiyê, parse
[kan dike qarûn.

Wek findê serhişk mebe, tu nabînî ew ji xêretê
xwe disoşit. Fedikire dilberê, mermer di mista
[wê de wek nûmê dihîlit.

Bedewén parisi, yêñ ko jiçinî dibexşinin ve ne.
[Meygero, here mizgîniyê bide pîrén parîst.

Ey xirqeyê wey lê rijandî, Hafîz bi hemîte xwe
li xwe ne kirîye. Ey şêxî daw û damen-pak
[me ji te divêl tu li me negirtî,

DÎROKA

JINA NAPOLYON

« Di dinê da her tişt ji heyina »
 « xurtî û mezinatîya Xwedê ta »
 « şahidok e ». Napolyon

— 6 —

VEGERA KORSİKAYE

Di Ilona 17.ian da Napolyon ji bo sê mehan careke din destûra çûyîna welatê xwe Korsikayê xwast û tevî brayê xwe çû. Ev sê mehêñ han wekî adeta xwe di nav kitêban da derbas kir. Her wekî xwe ji bo kîrén mezin pêk tanin; rojê pê da karê wi rakirin danîna xeritan û çêkirina meselîn hisabî bû.

Sê mehêñ destûre kuta bûn, Napolyon hîn ji Korsikayê ne çû bû û ne dixwast here. Xweya bû ko di vê dema han da fikira xwe gu iartîye. Qey ko hezkirina serxwebûna Korsikayê difsa ji nuh va di dilê wî da cih girti bû. Di nava van her sê mehêñ han da, bi serek Paolf û hevalen wî ra pir da û standi bû. Ew hemî yar û hevalen bavê wî bûn. Ci gava bi darî wan camérân diket, çîroka serxwebûna giravê, xebatén ko di wê râ da bûne pêşî û paşıya peyiva wan bû. Di nava wan peyivan da pir caran navê bavê wî û fedakariyên ko di riya welêt da kîrine derbas dibûn. Ne mikûn bû ko ev axaftin xwîna Napolyon bi kel nexin û şopine kûr û bi cih tê da nehêlin.

Edî wî qerara xwe da bû; nema vedigerî Franseyê. Heke leşkerî bû li Korsikayê jî hebû. Di nav leşkerî hólê kiçik da hîn çêtir dikari bû xwe bide naskirin... Li ser vê ramandê kete leşkerê giravê û Paolf ew kin kumandanê fir-qeke dilxwestiyan (gunili). Pişti vê kira han nema dikari bû here Franseyê; ji ber ko qanûna leşkerî di şolën hólê da cezane mezin didan zabitan leşkerberdayî.

Napolyon serekî di nav leşkerê giravê da ma û bi serek Paolf ra da û stand. Bi jîrî û jêhaffî bûna xwe hezkirina hemiyan, memaze a Paolf gîrte ser xwe. Heya ko Paskal Paolf der heqê wî gotiye: « Ew i ji havinê bokeyên kevin û wekî peyayen ko Plûtarxos salixa wan daye ». Rast jî serek Paolf mîrnaseki ecêb bû û ne i şaq bû.

Lê tevî ko heyâ wê gavê hezkirina Paolf di dilê Napolyon da roj bi roj zêde dibû; pişti ko kete nav leşkerê korsikayê, hin tişt dilê wî ji serek Paolf şikand û tew bi carekê lê sar



kir. Wî di tevgerên Paolf da tiliya îngilîzan didit. Cihê ko dixwastin ji fransizan bifilitin, wê téketana bin destên îngilîzan!..

Ev yeka han li Napolyon xwes ne dihat. Malîr ko dê serxwebûn tine buya, bi her awayî Fransiz ji îngilîzan çêtir didit. Qene rê û rézan, ol û adetîn fransizan pîrtîrî îngilîzan nîzîki ên korsikîyan bûn...

Li ser vê yeka han dilê Napolyon li Paolf ma; lê pişti ko dev jê derbas bû. Ji ber ko vegera Franseyê jê ra ne mikûn bû. Di vî devî da bû ko nûçeyekê héviya Napolyon vejand û dê bikari bîna vegeriya Franseyê « Hikûmeta Franseyê bi Nemsayê ra keti bû şer ». Di demêke hólê da tejez hikûmet hewceyi hemî zabitan bû. Di deverên wanî da li gunehêñ kevin, nemaze hólê biçûk, ne dilate nîhêrin. Riya Franseyê jê ra vebû bû. Bi vî awayî dikari bû ji Paolf xelas be. Ew Paoliyê ko di biçûkiya xwe da jê hez dikir û dixwast rojekê ji rojan mîna wî bibe; niha ji dixwast jê birevel.. kî zane, heye ko bavê Napolyon Karlo Bonapart jî di dawiya hevaliya xwe da ji ber sebebîne héja dev ji Paolf berda û pê ra bi der neket. Pişti panzde salan jî kurê wî rû ji Paolf ba didan û xwe davete himbêza hikûmeta Franseyê.

Napolyon di texmîna xwe da ne xapiya bû,

Dema għha Parfse di Gulana sala 1791an da rešbelekek berpeyf wezirceng kir u jè xwast ko wi vegerine leškeriyé. Di dawiya tebaxx da bi ritba sersemeriyé (yúzbaşı) vegerandin firqa wi.

Di nava van sè meħen ko li Parfse li benda bersiva rešbeleka xwe ma bù da, destengiya ko Napolyon ditiye tişteki ecċeb e. Tevf ko desté xwe digħi tħu u mesrefen zède ne dikir, di nav du meħan da bē pere ma. Ji neċarri saetta xwe firot; lè bi tištēn holē berikén vala tije ne dibūn. Ne xweya bù ko wezirceng dē kienha bersiva rešbeleka wi bide. Ji bo ko ne kevē


dafa birċbunne tiştekk hati bù bira wi; simsarija xaniyan!. Dixwast bi deyin cend xaniyan kire bike u wan bi bil-akki bilintir bi kire bide; heye ko bi wè karé debara wi bibe. I ē xwendijen xaniyan bi zabiteki holē zivar bawer ne bù bùn. Xwedè kir ko bersiva regħbeleka wi hfn pir ne ajot. Ciqas ko desengi kişand ji, ji bo nan ġewrija xwe hewceyf minetan ne bù.

Dema ko Napolyon ll Parfse di vè destengiya han da bù; dħja wi ji li Korsikayé ew teħħi dlikgħandin. Heċko zivarijé ne dixwest dev ji zarokken Karlo Bonapart. Lè her tişteki jè ra dawiyeck heye; teqez dē rojekk dawiya van destengiyan ji bihatana.

Hngħi li Franseye tevgera serxwerabunne għha bù dewreya paġin ane kér bi hest sekin bù. Ji ber ko legkeré Franseye ji ber ē Nemsayé direvni u xelkē ev sùċċe han diexist Stoye melfk. Gava serxwerabuyan di 20e Tfrimha 1792an da dirjejt qesra Twilleyi kirin, derē oda melfk šikandin u kumè sor dane serew wi; Napolyon f'li Parfse bù. Di dehhe Tebaxx wé salé da gava ajotin sera melfk u bi zor li ser tħett danfin u existin hepsè, dissa Napolyon f' hazir bù; lè ev tištēn han qet lè xwes ne hati bùn. Dawi, tevi ko ew hevali fikreke cimħuri bù ji, ne dixwest ko pexas tēkklif tištēn għis u hħi bibin u daxwazien xwe bi desté zoré bi hikumet bidin kirin.

BERDANA KORSIKÉ

Me derketina serek Paolf ji Korsiké tev sebebēn wé berer di cihé wé da goti bù. Piżżei serxwerabunne, gava hikumeta Franseye a nuh bingħen serbsti u wekhevijiet li nav xelkē belav kir; serek Paolf ē ko ji cend salan da li Inglistanē dima piżżei danstandinē bi hikumeta nuh ra vegeri Franseye. Hikumet rūmetekke mezin ji Paolf ra għirt u ew kir hakim girāva Korsikayé u koumandaré hemi leżker wé.



Tangeke emerikani, ji ttp̄e Serman, dl qada
seri Italyayé de dirjejt elemanan dike



Zirehpūgeke ingilti, di seri Italyayé de xwe daye bas-
keki xet-ten elemanu u ji duri ve güleyen xwe tħalli

Pişîf vê yekê bû ko gava Napolyon hati bû giravê û ne xwesti bû vegere Franseyê. Lé pasê dema tiliya ingilizan di hemî tevgerên Paoli da dît, ji kira xwe peşîman bû û dev ji hezkirina Paoli berda. Li ser vê bû ko gava kês dit vegeri Franseyê û bi yuzbaşîfî kete leskeriyê.

Di vê halina Franseyê da pir ne ajot ko gerek tiştén mein bûn. Di bajarên Liyon, Versay, Werems û Orléanê da kuştarine ecêb çê bûn. Her kesê ko bêhna hevaliya melikiyê jê dihat hate kuştin ko ev di dîroka Franseyê da bi navê « kuştara llonê » e bi nav û deng e. Di vê kuştara han da herçî peyayêna ola Mesih ji téra xwe hati bûn kustin û ên mayî bi der da revi bûn. Ji lewre hemî dêr û dibistân di bin destân wan da hati bûn dadan û şagirtên wan, keç û kur li derva ma bûn. Di nav şagirtên kecîn da, xweha Napolyon Eliza ji jî dêra San-Sirê hati bû biderxistin. Ji bo wê, bi lez destûra xwe stand û Eliza bir Korsikayê. Gava Napolyon giha Korsikayê navbera wi û serek Paoli li hev ket û ji kotekî teví xelkê mala xwe girav berda û hate Franseyê.

Di rojên vegera Napolyon da bû ko careke din Paoli dixwast xwe ji hikûmeta Franseyê qut bike û serxwebûna giravê ji cihanê ra bide zanîn. Malbata Bonapart di vê yeka han da, wek berê ne bû bûn hevalê Paoli. Bi vê kira han bi carekî di çav heval û hogirêna Paoli da bi derketi bûn. Li ser vê yekê serek Paoli fermana zarokên hevalê xwe û kevin Karlo bi derxist û xwîna wan da rijandin.



Jİ ŞATOYÊN İNGİLÎSTANË YEKKE KEVNARE

Herçî Napolyon, peyayêna Paolf bi re va dor lê girtin; lê Napolyon bi jîriya xwe ew xapandin û ji nav lepêna wan filîti. Lé diya wî Létsiya, pişîf vê yekê sibekê, xérwxazekî haya wê kir ko cotkar û pêxasen Paolf têne ko dirêjî mal û zarokên wê bikin; hema da xwe bi destân zarokên xwe girt û bi çolê ket. Ev malbat çend rojan holê cih û war li ber saxa (sahil) deryayê ma; heyâ ko Napolyon ji wan ra çareke bi derketina giravê peyda bike. Di nîvê şeveke tarî da Napolyon ew existine Kelekeke (zewreq) servekirî û di nav pêlén deryayê en wekfî ciyan da berê wan da erdê Franseyê û iskela Marsilyayê.

Ma dihat bîra kî ko ev zarokê mihacir, keç û kur, diçin ko bibin melfîk û melfîkeyen Ewropayê?!

MALBATA BONAPART LI FRANSEYÊ

Dema malbata Bonapart giha iskela Marsilyayê, bê ko bikarin ji xwe ra poxaneke (mesken) peyda bikin, xwarina wan a rojekê tîne bû. Hîngê diya Napolyon berê xwe da daîra belediyê, da ko rîyeke debarê jêra çar bikin. Dilê xelkê belediyê bi wê şewîfî û jê ra arîkarî kirin.

Di nav kesen ko bi Létsiya Ramolino ra arîkarî kirin, têcîrê sabûnê Mr. Kilarî bi awakî camêri destê arîkariya xwe dirêjî malbata Bonapart kir. Demekî dirêj ne ajot ko nasî û dostaniyeke çak di navbera her du malan da hate pê û du sal bi ser da ne çû bûn ko Jozef Bonapart bi keça wi têcîrî ra zewîfi. Heta Napolyon ji çav da bû duşka brayê xwe; lê keçikê kîfa xwe ji wî zabitê jar û qîriç ra ne anî bû.

Heçî biçükê biran Losyan, xorxekî jîr û sergerm bû. Bi vê sergermiya han keti bû nav serxwerabûyan û bi gotarên agirfeşan ji xwe ra cih çekiri bû. Di demekî welê da ko ke i Napolyon nas nedîkir û nikari bû arîkariya malê bike, Losyan di nîzîki Marsilyayê da bi xêra wê sergermî û hevaliyê karekî baş dîtî bû û malbat pê bi xwendî dikir.

OSMAN SEBRÎ

MÉRIK İ DİN E

Héj nû zewici bûn û gelek heji hev dikirin. Bi timobile digeriyan. Gîhaşti bûn Nyünglandê. Mérîk timobil li lez tajot. Timobil li dareke kenvare ket û sekinti. Tu tişt bi mérîk ne hati bû. Lé jina wî bi bîrîneke xedar birin bû bû. Dilê jînikê ji bir ve çû bû û xwîn ji seri dihat.

Ew der xelaseka bajér bû. Tûkesi bi rô ve xuya ne dikir. Li rast û çepé çend xani hebûn. Mérîk li ber deriyekî lewha diktoran dili bû. Rahîste jina xwe û berê xwe da wi xanîyi, xantki kevin. Li deri da. Yeki bejinbilind, gewr bi por û riha wî keti, derî vekir.

Mérîk di dilê xwe digot, kes li mal nine, diktor bi xwe deri ji me re vekir. Ji xwe ew diktor û li mal bi tena xwe bû.

Diktor li jînikê hûr bû û gote mérê wê: Qehşî seri şikستي, hestî daye mejt. Jê re emeliyatî dîvîtin; emeliyateke dîşvar. Heye ko çêbibe. Lé tu dibîni ez bi tena xwe me, kes nine ko arika-riya min bike. Dîvîl tu li ber destê min bixebilti.

Mérîk bivê nêvê pê qîm ani. Nikari bû bi awakî din bikira; jînik wô bimiriya. Lé ode di haleki ecêb de bû; her tişt tevlî hev. Tu dibêji qey ji mêt ve tukes ne keti bû-yê.

Jînik benc kirin û diktor dest bi emeliyatê kir. Li ber emeliyatê dilê mérîk dibori û dikir

ko bikeve erdê. Diktor pê hesiya û gote mérîk: Édi ez dikarim bi tena xwe jî bixeblîm. Heke dixwazi derkeve derive.

Mérîk derket derive. Di liwanê de diçti wi seri û vedigeriga vi seri. Ji nişkeké ve sé peyagén bi çek, bi hergeki re şejderbek, lê peyda bûn û dikirin bikevin oda emeliyatê. Mérîk ré li wan girt û bi lavlave gote wan: « Ez di bextê we de me, mithletê bidin-ê heta ko emeliyeta jina min bigedine. Pereyê min ji ji we re ».

Yeki got: Ji te ve em kî ne?

Mérîk: Ma hon ne diz in?

Wi yeki (bi ken) got: No em ne diz in. Em pasvanan bîmaristanê ne. Mîroué ko jina te emeliyat dike dîtnî har e. Ev bûne du sael ko ji bîmaristanê reviyage. Em hatine wî bigirin.

Her çar bi hev şewirin û qerara xwe dan ko heta davîya emeliyatê li hêviyê bîminin û pişti emeliyatê wî bigirin.

Mérîk ji pasvanan zani ko mîrovê din diktoreki bi nav û deng bû. Lé piştre ji ber zédahîya xebatê din bûye û ketiye bîmaristanê.

Yeki ji pasvanan digote mérîk: Ez dibêjîm diktor emeliyata xwe wê bibe seri. Ji ber ko dinine wele gava bi sinhela xwe mijûl dibin ji-bo wi demi egîlê wan wedigere seri.

Her çaran di pencerê re li diktor dînihîrtin. Dema ko diktor emeliyeta xwe gihande davîyi û serê nerxweşa xwe gîreda pasvan lê der bûn. Diktor kir ko li ber xwe bide, lê wan ew zemt kir û birin bîmaristanê û ji bo jînikê diktoreki din şandin.

Pişti çend rojan mérîk jina xwe kire Nyûrkê û ew kire xestexaneke mezin. Diktor xestexanê li jînikê hûr bû û gote mérê wê:

— Jina te wê çitibe û wê vegere halê xwe è berê. Lé tişt heye ko ez tê dernayinim. En'e liyata ko ji jina te re şekirine işeki zehmet e û wê emeliyatê bi tenê diktorek heye ko dizane çêke; ew ji din bûye û iro di bîmaristana Nyûnglandê de ye.

Mérîk kent ú got: Ewi diktor bi xwe çekir.

XELÎLÊ GENCO
22



BERGEHEK JI GUNDEKİ İNGİLİSTANË

CİN

Ü TARİXA MEDENİYETA WĒ

DR. LYONEL CAYLEZ

Çin, çina paşvemayı di tarixa medeniyet de xudan cüheki bülnd e. Gava Europa iro, di wehşeté de bù xelké Cin li ser kaxezé dinivandin. Lê piştre Çin di xew re çü, Europa hisyar bù. Der heqê tarixa medeniyeta Çiné bendeke caizbedar bi çavé me ket. Xawen Dr. Lyonel Caylez e. Me ew bend li jér ji xwendevanen xue re wergerande Kurdmanciyé.

Di heqê çiniyan de gelek çfrok û efsane hene. Lê li gora tarixê çinî fro ji 4000 salı bêtir in ko di mintiqâ cemê zer de bi cih bûne. Dibéjin ko çinî ji cihine din yên Asyayé, ji roavê an ji merkezé, hatine welatê ko fro té de ne. Lê re te delfî û birhan nînin.

Di pêşiyé de çinî bi tenê bi cotkariyê mijûl dibûn. Piştre dest avêtine hin sen û zanistiyé. Wek çekirina porslané, yanî ferfû, çekirina dermanan ji giyan û tiştin ji felekiyaté.

Piştî midekî bi madenê tunc xebîfîn û jê fraxin çekirin û li ser wan fraxan nivîsarin nivîsandin. Ji eserên kevin yên ko ketine dest dixuya ko di sedsalen 15 û şanjdehan berriya mîlada Isa de, çinî di vê sinheté de tişfakî pêş ve çü bûn Hin qalikên kîso, hatine dîtin ko li ser wan pirsiyarîne kahinan hebûn.

Ev medeniyet di wextê malbata mîrekén

Sang de çêbûye. Lê bi temamî nayete zanîn tixibên dewleta vê malbatê ci bûn. Lê herhal ne tiştekî mezîn bû. Payîtexte vê dewletê di nizingî bajarê ko iro jê re « Keyfinc » dibéjin de bû. Navêñ hin melîkén vê malbatê li ser hestiyân nivîsandi hatine dîtin.

Bî texmîn di sedsala 12 an de beriya (m. f.) (Milada Isa) dewleta malbata « Co » ya ko li aliyî roavê rabû bû dirêjî dewleta malbata « Şang » kir û li dawiyé zora wê bir.

Ev hakimên ha ji esilekî din û di medeniyeté de ji miletén ko xisti bûn bin destén xwe paşvetir bûn. Ji lewre medeniyeta Çiné midekî dirêj sekîn û xelk ji nû ve vegeriyân hoveberiyê.

Nîzama welât istibdad û aristokrasî bû. Lê piştî hatina « malbata nû nizam ji hate guhartin. Hükümeta nû torinêñ welât bi çend biran leva kirin û welat bi wilayet û qezan lêk vekirin. Ew wilayet ne weke hev, hin piçük hin mezîn, lê tev de bi melîk ve girêdayî bûn û melîk bi her awayî hikim li wan dikir. Ev nizama nû li welât hat û di destpêkê de bi saya melîkê pêşin mîr « Koçwîkû » çû serî.

Lê mîrên din yên ko di pey « Koçwîkû » re hati bûn ne di dereca wî de bûn. Dest bi israf û zilmê kirin. Walf û miteselman serî hildan û li melîk rabûn. Ji milê din qibileye wehşî yên ko li tixûban bûn, wan ji dest bi xerabiyê kir.

Di sala 842an de (b.m.f) « Feriya Milada Isa » xelk li melîk rabûn û ew danîn.

Lê piştre melikite din ji nîlbatâ « Caw », melîkîne eqilmiend hatin û k rê welât ji nî ve saz kirin, tî vê heyamê de nîfûza waliyan zêde bû bû û wilayetén mezîn ên piçük li ser xwe zêde dikirin.

Lê piştî midekî nîfûza wilayetan ewçend mezîn bû ko nema guh didan merkezé. Vê heymê qederekî dom kir û welatê Çiné bê dewleteke yekbûyi ma. Li gora eserên ko gihaştine destén me ji vê fasîle re fasila « Bihar û Paizé » dibéjin. Vê fasîle



Goleke bidestçekiri. Gola ko klişa me şanî dide di Ingilîstanê de ye. Ev gol di sala 1730l de kolane û av berdan-e.

ji sala 722an (b. f.) « beriya İsa » heta mirina Konfiçyüs, sala 479an (b. f.) dom kiriye.

Di vê fasilê de hakimine wilayetan rabûn û xurtiya merkezê xistin destên xwe. Di nav wan hakiman de nemaze hakimên wilayetên Çi, Sûng, Ça, Ço hatine nas kirin.

Konfiçyüs bi xwe ji xelkê wilayeta « Lo » yê bû, di dora Şantonga fro de. Koficyüs mamoste bû, dersa exlaq û felsefê digot. Konfiçyüs têkili siyasete ne bû bû û qala diyane tê ji ne kiri bû. Bi tenê dixwest xelk ji ibadeta rih, nemaze rihên bav û pêşyan biparêze. Lé ev adet hetani fro ji li welatê Çinê heye. Ji milê din Konfiçyüs digot divêt mirov ibadeta xwe li ezmanan bike. Bi vî awayi bi nizingahî ve ibadeta Xwedê qest dikir.

Li Çinê nizam û rêmika kahinan gelek pêş ve çû bû. Vê nizamê ibadeta rihan diza, Çinîyan ibadeta rihên miriyên xwe dikir û bavinî wek kaniya her qencyî nas dikirin.

Pend û şîretên Konfiçyüs ewçend guhdar peyda ne dikirin. Ji ber ko hakim û melîken wi wextî dixwestin bi her awayî de ber çavên xelkê de bêne teqdîs kiri. Tesira nizamên Konfiçyüs ancax pişti şikestina zorkerîyê xuya dikir û şekiyên xwe didan.

Melîkén malbata Çaw, pişti Konfiçyüs ji qedere 200 salî hikim kiri. Lé hikimeki bê nizam û di nav sûreşê de. Serekên eşîran ên xurt li hikûmetê asê dibûn, ser dikirin. Serine welê ko carina qebileyin bi temanî winda dibûn.

Lé tiştê ko sezâ ye mirov lê ecîbmayı bimîne ew e ko piraniya zana û hinermendên Çinê di vê heyamâ sùresê de jiyy bûn û eserên xwe mîvisandi bûn; herweki Konfiçyüs. Jê pê ve ji herçî zanayân ko di wî wextî de peyda bû bûn nikari bûn tesîr li xelkê bikin. Bi tenê nezeriya ko di wî heyamî de hati bû danin û digolîn-ê nezeriya Taw, pişti midekî tesireke mezin li ser jiyyâna Çinê kir.

Welê dixuye ko di sedsala 13an de (b. f.) nizamâ zorkerîyê ya ko malbata Çaw d nî lü hati bû qelandin. Lé meseleke mîhim hebû. Ji wa i wilayetên bi erxwe niho kijan wilayete serdestîya hemiyan dê bikira. Di nav wan hemî wilayetan de ji hemiyan xurtir wilayeta Çina roavê bû, ew ji di halekî nîv-we'şî de bû.

Ses wilayetên din gihane hev, gotina xwe kiriş yek da ko li ber wilayeta Çinê bisikinin û nehîlin ko ew wilayet bibe hakimê wan. Lé wilayeta Çinê berberî xiste navbera wilayetên din, ew berdan hev û yeko yeko zora wan bir û dest danf ser hemiyan.

Di sala 246an de (b. f.) ji vê malbatê la-wikefî sêzdehsali bû melik û pişti ko 25 salan hikim kir, bû imperatorê hemî welatê Çinê, Çina yekbûyi. Lé ev ji hakimeki mistebid bû, lê welat xisti bû nîzam û inzibatê.

Wî melikî di siyaseta xwe de niqteyên jêrîn dan ber çavên xwe û ew bi cih anîn:

1 — *Neyartia mezheba Konfiçyüs û şagirtén wê mezhebe kîrin.*

2 — *Nizama ko welat bi wilayetine ser xwe lêk ve dikirin rakir û ji her wilayetê re ji merkezê waliyên sivil û eskert tayîn kiri. Ew wali di her kart de bi merkezê ve girêdayî û bi tenê li ber melik berpişiyar bûn.*

3 — *Di nav xelkê de zilamin hebûn ko kitêbén zana û feylesofen hegymen bori xwendî bûn, wan pê digirt û nizama melik tenqid dikirin. Melik rabû hemî kitêb, ji kitêbén tîb, colkari û kahinîgê pê ve, şewitandin.*

4 — *Di tîxûbén Çinê de qebileyin wehî wek Hesýungê hebûn ko ji selameliya Çinê re talûke bûn. Melik rabû kelehen tîxuban bi dwarîne stûr gîhandin hev û benda ko bi benda Çinê bi nav û deng e anî pê. Ji bo şekirina vê bendê ji mehkûm û hésiran bi sed hezaran peya xebîtin. Dirêjahiya bendê 1500 mil e û ev bend ji bakurê Kansûyê dîgehe xelîca Lyatsûngê.*

5 — *Kel û qesên welet hemî kiri wek hev. Isülê xwendîn û nivisandinê gîhande şikileki sade û ew di nav xelkê de belav kiri.*

Herçend piraniya nizamên vî melîkî qenc û ji we'êt re bi kêt bûn, ji ber ko di tetbiqkîrina wan de melîk dida wasiteyine sext û hişk xelk jê téşihan. Ji lewre bi mirina wî re di welet de şûres destê pê kir. (b. f. 210) Gundiyek bi navê « Lînbang » ji xelkê wilayeteke nîvro li hikûmetê rabû, bû ser. Gundî zora hikûmetê bir, hikim xiste destê xwe û malbatata « Han » danî

Hikimraniya malbata « Han » bi hin fasileyan qedere 10) salî dom kir. Nîrov dikare bibêje ko nizamên Çinê ên siyasi û civakî, ji bo midekî dirêj, di wextê vê malbatê de hatine danfîn. Di wextê vê malbatê de ji carina hakanîn wilayetan bi istibdadê hikim dikirin lê vê kirdeyê, herweki di wextê malbabâ « Çaw » de, nîfûza merkezê kêm ne dikir.

Disan di wextê vê malbatê de fen û zanistîyê ji nû ve dest bi şînbûnê kiri û mezheba Konfiçyüs bû mezheba hikûmetê a resmi. Li ser vê yekê giregir û malmezin bi neqencyî zilmî hesîyan û xwe li ber wîjdana xwe berpişiyar hesibandin. Di nav xelkê de ji fikira istiqalâ şîn dibû. Ji xwe herçî gundiyan

çiné hengav ji istiqlala
gund û beledé xwe re
xwahesker bün; di wexté
melfkén zorker de ji.

Di wexté İmperator
« Wo » de nifûza Hes-
yungan ji hate şikestin
û heyama wi midék
dom kir. Tixubén impe-
ratoriye fireh bün.

Di sala 25an (p. f.)
(pişti İsa) malbata (Han)
dest bi kişwerkisiyiyé
kir. Di bin emiré fer-
mandar Banço de ordi-
wek cù heta Xurasané.
Nimnendeyek rékirin
Romayé. Lé nimnendé
pişti ko gihaşte xelica
faris jé vege riya Çiné.

Edî qala qebileyen
Hesýung ne dikirin.

Ordúne bi nizam zora wan biri bün. Dibéjin
ko qebileyen wehşî yên ko di bin fermandar-
iya Etilé de diréjî Ewropayé kirine, ji vi
esil bün.

Malbata Han bi vi awayî hikim dikir û
Çin pêş ve diçû. Lé di vê navê de yek ji
meyildarén nezeriya « Taw » rabû û got ko pê
re qeweta şehîre heye. Terefdarin jé re çebûn
û li hikümeté asé bün. Serxwerabiyen li serê
xwe xavikine spî dipêçandin

Li ser vê yekê Çin ketiye anarşîye, yanî
bêqanûniyé. Şerîne mezin çebûn û welaté Çiné
bi se hikümetén mezin lêk ve bün. Heçî qebî-
leyen bakur-roavê ji vê firsendé istifade kirin,
serî hildan diréjî bajaran kirin û li Çiné
şanzdeh hikümetî peyda bün û welaté Çiné
cardî kete anarşîye heta wexté ko li bakur
teteran û li nvro malbateke Çiné hikümetin
danin.

Di wi heyamî de Ewrope di tarftiya
nezaniyé de pûyan bû. Herçî Çin reşma ko
qebileyine wehşî bela xwe didan-ê, xwe ji weh-
şeté diparast. Di wi wextî de mibesirine mez-
heba Bûda keti bün Çiné û bûdehî[1] di
nav çinian de belav dikirin. Jé pê ve xelkê
Çiné ji bo peyda kirina kitêbén vê mezhebê ên
miqedes dijûn Hindistanê û bi vi awayî bi me-
deniyeta Hindistanê re ji aşinahî peyda dikirin.
Jî milé din çinian isülê çekirina kaxezé ji dîti

[1] Bûdehî ji mezheba « Bûda » re dibéjin. Ev
mezheb pişti mezheba Brahma di Hindistanê de
hatiye rû û piştire derbasî Çiné bûye.



Ingiliz ji niho de Payitextê xwe û xerabûyi saz dikin. Klişâ me
tareke Londrê şanî dide; ya ko di wexté bombardan de xerab bûye.

Ingilizan ew tar vê paşîyê ava kriye.

bün. Xéra kaxezé medeniyet ji érişâ wehşiyân
diparistin.

Çinian kaxez di sala 100ê mîladê de
de peydâ kiri bû. Herçî ewropayıyan pişîf wê
bi hezar sali kaxez çekiri bün.

Di saya kaxezé de ji nivisandinê pê ve
resamî ji pêş ve çû bû. Teswîrên resamê meşhûr
Long-Min yên ko li ser keviran kolayı bün li
ber digertin û nivîşten wan zêde dikirin.

Di heqê Çiné de dibéjin ko Çin wek be-
hireke fireh e û heçî çem û lehiyên ko lê
diherikin hemî wek wê şor dibin. Xéra vê
qabilîyeté Çiné heçî hêmanen biyanî, (insirên
ecnebi) ew daqurtandine û beriya sedsala şe-
şan yekîtiya xwe a nijadîn anî wicûde. Ev yekîti
di heyamê malbata Syû de hatiye pê.

Di heyamê vê malbatê de jê pê ve islaha-
tine mezin ji hatine çekirin, wek kolana cowen
avê yên ko cotkariya welêt pêş ve dibirin. Lé
ji vê islahatê re pere diviyâ bû. Ji lewre wér-
gûne giran li xelkê hati bün ferz kirin. Ji ber
wan wérğyân xelk li hikümetê asé bün û di
sala 618an de malbateke nû bi navê (Tang)
rabû ser textê Çiné.

Qehremanê vê hereketê (Lîşyémîn) bû ko
pişti mirina wi legeba (Tay-Tsung) lê kirin.
Tay-Tsung di nav fermandarî sergevazén Çiné
de yekî bijarete ye. Di zemané wi de di hundire
welêt de islahatine mezin çebûne. Fen û zanîstî
gelêkî pêş ve çûn. Herçî siyaseta xarîci, di vî
warî de ji Çiné xurtîke mezin şanî da. Tixubén

imperatoriye ji Pesifikké gihaştin heta gola Xwarzem.

Di wî heyamî de li Çinê û ji vê malbatê hakimine mezin û héja rabûne; wek imperatora « Wo » ya ko qederê 50 salf hikim kiriye û imperetor Heswan Tsung yê ko quesira wî bû bû sépîla şair û hinermendan.

Hingê çînî di sen û medeniyetê de raserî hemî miletên dînyayê bûn. Lê yekî ji berdevkên imperator, yekî teter, bi çend hevalan ve xef û sêwir kir û li hikûmetê rabû. Serxwerabî hin bi hin zêde bûn û derbeke xurt li malbatê Tang dan. Bi mîlyonan mirov hatine kuştin û vê sûreşê qederê 150 salf dom kir. Xelkê Tibetê dirêjî payîtextê kir. Ji milê din qebileyén wehşî yêng ko li tixûban dijin ew jî rabûn. Hakkimê wilayetan jî bêbextî li merkezê kîrin û di sala 956an de ev malbatâ han yekcar xerab bû.

Di wextê vê malbatê de her texlit fen û hiner di welatê Çinê de pêş ve çû bûn. Ji milê din disan di heyamê malbatê Tang de fena çapê ya ko bûdehiyan ji bo çapkîrîna kitêbên xwe ên miqedes ceribandi bû, çû serî. Dîsan di heyamê vê malbatê de isûlê imtihan û misabeqê hate danîn. Ji bo memûriyetên hikûmetê xelk ji cihine dûr dihatin merkezê û diketin imtihan û misabeqan.

Piştî van şüreşan welatê Çinê cardî ji hev de ket û di nav 50 sali de pênc malbatan

lê hikim kir. Lê hikimê her malbatê midek-kurt dom dikir û hikimê wê li erdekî sénckirf girtî dima. Di vê navê de li aliye bakur dijmînekî nû xwe kar dikir.

Wextê malbatâ Sûng cih girti bû qebileke tongizan bi navê Xetay di nîvroyê benda mezin de mixdarek erd xisti bû destêne xwe û hikûmetê nikarî bû ew jê biderexista.

Ji xwe di sedsala yanzdehan de çîniyan di nîvroyê çemê zer û di dora payîtextê xwe de li hev civiya bûn hev û ne dikarin berevanîya welatê xwe bikiranâ, heta roja ko fîrsend bi dest wan ket. Ji mongolan qebileke din hebû; jê re digotin Notçin. Ev her du qebile bi hev nexwêş bûn û bi hev re neyartî tajotin.

Lê gava wan û çîniyan li hev da; çîniyan nikarî bû zora wan bibira. Ji bervajî ve çîn şikestin û ji Xetay re hêj bêtir erd terk kîrin, ji payîtextê xwe rabûn û bajarê Hang-Çawê ji xwe re kîrin payîtext û bi neyaran re miâdedeke silhê çékîrin û xwêkî dane wan. Digel vê hindê di heyamê Sûng de medeniyeta Çin weke xwe ma. Herçî fen û şîir ne wek di heyamê Tang de bû. Lê di tarix, felsefe û di zanistîyen siyâş de biserveketineke mezin hate pê. Di sala 1069an de imperator li ser pêşnîhada misteşar Wangençê hin islahatên daxîl qebûl kîrin. Lê xelkê kevinendiş, yanî yên ko bi fikirine kevin emel dikirin, li van

islahatan rabûn û di jiýna imperator de ew islahat edim kîrin.

Di sedsala 13an de mongolan her û her dirêjî Asayê dikirin. Çîniyan digot ko xera tecribeyên ko bi Xetay re kîri bûn ewe bi mongolan bikari bin. Lê icar halê Çinê ji wextê Xetayê xirabtir bû bû. Neviyê Cengizxan Qobelay ne bi tenê bakurê welet, lê li nîvroy, erdê Sûng jî vegirt û bi vi awayî di tarixê de ji bo cara pêşîn Çin bi temamî ket bin hiki-mê biyaniyan.

Seyahê venedfkî Marko Polo di xatiratên xwe de qala timperatoriya Qobelay kiriye û tiştine spehî gotine. Lê Marko Polo tiştên ko çîniyan dest pê kiri bû û mongolan biri bû serî tev de bi aliye mongolan ve daye û ew tişt wek eserên wan şanf dane.



JINÉN INGILIZZI DI XIZMETA WELÊT DE

Mixdarè mongolan yén ko Çin vegirli bün li gora nifusa çiniyan gelek hindik bù ù karé hikümetê rexma wicûda vegeriyaran disan bi piranî bi destên çiniyan dihate gerandin. Ji lewre qenc ne hatiye zanîn hikimê malbata « Ywan » cıqası dom kiriye. Lé tiştê bëşik ew e ko heta rabûna Çoywanşang çîñ di welatê xwe de bindest bûn.

Bi rabûna Çoywanşang malbateke nû bi navê Ming rabû ser text. Vê malbatê ji roja pésin de esasek danî. Li gora wî esasi ji Çinê re diviya bù qutbiriya xwe ji xelkê xerîb bike ù tixübén xwe ji biyaniyan re bigire. Belê, çiniyan li tarixa xwe dinihert û didit heçî belayen ko hati bûn serê wan bi destên biyaniyan pêk hati bûn. Vî half qederê 200 salf heta peyda bûna mibesiran dom kir û bûyeren wî heyamî ji xelkê re nenas mane.

Mongolén ko ji Çinê hati bûn bi der kirin, gelek caran ceribandine ko imperatoriya xwe ji nû ve saz bikin. Lé li her carê şikestin û di wextê imperetor (Çengsû) de welatê wan bi xwe hate vegirtin: lé wî vegirtinle gelekî dom ne kir. Ev imperator bû ko payîtexte xwe guhaste Pêkingê û avête ser welatê Anamê û di riya behirê re heyetin şandîn girava Sôlanê û welatine din, di Pesifikê de. Dîsa di wextê vî imperatorî de û bi emirê wî ferhengeke edebiyatê hate saz kirin. Di wi heyamî de edebiyata çîñ di temaşa û çiroknîfisiye de tîfakî pêş ve çû bû. Çiniyan ev tişt ji mongolan digirtin.

Lé ev malbat jî ji ber bêexlaqaqa gregoran hin bi hin mehiw dibû. Qursanen^[1] japoni tavêtin peravan û di Koreyê de şerin çédibûn. Vî half heta sala 1516an bî vî awayî dom kir. Di wê salê de vaporeke portigali gihaşte bendera Kantonê û portigalyan tê de mësiseyine ticarî danfîn. Bi vî awayî Çinê bi ewropayıyan re dest bi dan û standinê kir.

Di pey portigalyan re spaniyan di giravén Filipinê de mîstemikeyek danfî. Holendîyan ji birekî girava Formozé vegirtin. Ji milê din mibçîrên ko diketin Çinê ji diyanetê pê ve medeniyet ji belav dikirin.

Lé disan şüreşan di Çinê de dest pê dikir. Mançukiyan di bin fermandariya sergevazé xwe Norhatço de destên xwe diréjî tixübén bakur-roavé dikirin. Di vê navê de xelkê Çinê bi hev keti bûn û berberî bi hev re dikirin. Mançukiyan ji vê firsendê istifade kir û berda

[1] Qursan, mijdevenân behirê. Yen ko bi rê ve gemian digîlinin an tavêjin peravan.

Pêkingê, payîtexte welét, çîniyan gelek' li ber xwe da. Lé li dawiyê zora wan çû û mançukiyan welat vegirt. Di wî heyamî de û bi saya imperatorên Kanghesî û Çinlong Çin gihaşte aşı û refahêke welê ko di diréjahiya tarixê de ew ne ditî bûn.

Vî heyamî qederê 60 salf dom kir û li Çinê her textîl sinhet û zanîn pêş ve çûn. Edalet di welêt de bi cih bû, wêrgüyên giran hatine rakirin û xelkê bikhina xwe da.

Di sedsala 18an de gava Ewrope di şerên Napolyon de pûyan dibû, nifusa Çinê li xwe zêde dikir û dibû sé qat.

Disan di wî heyamî de bû ko çiniyan ji bo cara pêşin şerê ewropayıyan kir. Şerê pêşin bi ingilizan re çebû. Ingiliz ji şerten ko çiniyan ji bo ticaretê danî bûn azîz bûn. Rabûn du caran heyetin rékirine Çinê da ko bi van meselan mijûl bibin û jê re heleké peyda bikin. Lé teşebisa her du heyetan ji peşîl; bû şer. I i dawîya şeri de ingilizan Honkong vegirt, çiniyan benderen Çinê ji ticaretâ Ewropayı re vekirin û Çin bi tezmînameke giran mehkûm bû.

Piştre şerekî din jî çebû. Vê carê ingiliz û fransızan pev re diréjî Çinê kirin û Pêking zemt kirin.

Di pey wê re li Çinê şerekî daxilî çebû ko jê re serxwerabûna Taybing gotine. Ev serxwerabûn bi destên çîniyen ko bû bûn meslüf hate pê. Vê serxwerabûnê berê xwe da bû malbata hikimdar. Ev serxwerabûn di wextê imperetoriçe « Tsühfî » de çebû bû. Pişî ko bi milyonan peya hatine kuştan serxwerabûn bi arşkariya biyaniyan hate temirandin.

Di pey vê serxwerabûnê re japonan diréjî Çinê kir û bû şer. Pişî vî şerî ji esyanekî din çebû û serxwerabîyan diréjî şefaretxaneyen bîyanî kirin û taxa ewropayıyan mihasere kirin. Ewropayıyan Çin cirîm kir û jê tezmînameke mezin standin.

Herçî malbata mançû ji pişî vê esyanekî mehiw bû û Çin bû cimhûriyet û di sala 1912an de Dr. « Sûnyatsin » bû şerekcimhûre Çinê.

Lé Çinê disa rahefi ne dit. Japonan bela xwe da bû-yê. Japonan pişti ko Mençûrî ji Çinê stand di sala 1937an da diréjî wê kir o perava wên wê tev de vegirtin. Lé général Çankayşek li pêşîya japonan sekini û şerî wan kir. Ji roja ko japonan diréjî Emérîkayê kir Çin ji kete sefa hevalbendan û digel wan şerî japonan dikit.

JINA KÊMXWARIN

Zilamek hebû, ne gelek dewlemend bû, lé té nan dixwar. Lé cıqız ú destgirti bû. Desté wi li pereyé wi ne dic  .

M  rik dixwest jin bikit. L   li ber mesrefa jinik   diket. Dic   cem cam  an    digot: Min div  t ez bizewicim. L   ez miroveki seqtr im; min pere nine. Ji min re jinikeke k  mxwarin    k  mesref divedtin.

Xelk   digot, kecika ko tu dib  jt nik me peyda nabit.

Di wi bajari de kecikeke sehraza hebû, bi mesela m  rik hesiya bû. K  cik   gote ba  p xwe, heke m  rik qesta me kir ez qima xwe p  tinim; tu hema her   bike.

K  cik   bi ser de hin s  ret ji li bav   xwe kirin da ko bizaran li m  rik vegertin. Bav, j   pi  ktir   end kec  en din ji heb  n.

Rojek  , zilam   cıq  z qesta mala kecik   kir    mesele ji bav   re got.

Bav   kecik   gol-  : Ke  en min tev de k  mxwarin in. Nemaze a mezin bi heway   dijti, lu girar   naxw  l.

M  rik k  fxw  s bû, kecik mehir kir    ber   xwe dan ko bajareki din, da ko   end roj  n xwe t   de bibor  n. Anglo c  ne meha hingivint.

Jin    m  r li ot  lek   peya b  n. Wex  n   v u ta  siy   m  rik di  q derve di dikanine begalan de bi perek   hindik t  r dixwar. Li jina xwe ne dipirst. Ma jinik bi heway   ne diji...

Herci jinik   pi  ti ko m  r   w   di  n s  uk  , bani lawik   ot  le dikir    ji xwe re siraxine bijarete    giran dida anin; w   ji t  r dixwar.

Pi  ti   end rajan qera a xwe dan ko vegezin mal. M  rik hisab   xwe xwest. J   re hisab ant  : hisabeki d  r    direj. T   de ji bo hero heq   s   dan  n xwarin   heb  n.

M  rik li kavez   nih  rt    gole ot  lt:

— Heyran, ev ci hisab e. Min keng   di ot  le de xwariye?

Otelci: Bel   rast e, te ne xwariye, l   xanim   xwariye.

M  rik c  n jina xwe, j   pirst    got: Hirmet ev ci bazar e?

Jinik   gol: Bel   - di mala bav   xwe de ez bi heway   dijim. L   ji roja ko ez hatime nik te ez qul b  me, nema hewa di min de disekine. Ji lewre ez girar   dixwim.

M  rik ji jinik   hez kiri b  . Hineki da eqil   xwe, l   deng ne kir    bi r  va dev ji nemerdiy   berda.

PIRB  J

HINDIK RINDIK

GIYAY   KO DIKUXE — Heta niho gelekkar   caran hate bihiştin ko giyay  n hene ko goshti dixw  n; kulflikin hene dikenin; hin  n din digir  n. L   giyay   ko dikuxe me ne dizans!

Ji ber   de di kit  b  n giyanas de me ditiye ko giyayne goştxwer hene. Wan giyan pel an kulflikine di şikile fincan   de hene. Dev  n wan kulflikin vekir   ne. M  s, mox an texlitek ji wan heywanan dikevit nav fincan  n wan giyan    dev   fincan  n t  te girtin. Giya aveke bidem  s berdide    heywav   ko keti-   de v   av   de dihele    bi v   awayl giya wi dixwe.


Disan kulflikin hene gava vedi  n l  v  n wan wek l  v  n mirov  n ko dikenin ji hev dibin    dicemin. Hin  n din ji pel  n xwe wek r  v  y mirov  n ko digir   diqermi  n  n.

L   v   pa  siy   di wela  n germ de giyakti wele hatiye ditin ko dikuxe. Gava mirov tozek   li ser pel  n v   giyayf direşne pekpekokin l   ç  edibin. Ev pekpekok, pişte    h  dika diteqin    gava diteqin ji wan dengekf   wele dert  t ko dimine kuxika xen  kok. Reşik  n wan toza birinci bi wi giyayf wer dikin    p   w   didin kuxandin.

JI ADET  N XER  B — Dib  jin ko teter  n. Asya nav  n gava dixwazin yek   biezim  n sl  v   an ta  st  , dicin mala m  rik    b  f ko j   re tiştek   bib  jin guheki w   dikişin  n.

Di hemf tiyatroy  n dinyay   de adetek heye. Heke temasagerek di orta temas   de dixwaze derkeve derve vitikek — kertek — didin-  . Di veger   de v   vitik   li ber deri şanı dide    dikeve hundir. Wel   dixuye ko di tiyatroy  n japon de adeteke din heye. Heke temasagerek dixwaze derkeve derve kefa dest   w   bi morek   şeqil dikan    di veger   de li kefa dest   w   diniher  n. Ji ber ko li Japonyay   tiyatro bi saetan ve tajon. Heye ko m  rik derkeve vitik   bide yek   din    w   yek   belas b  xe tiyatroy  .

L   heke y   ko derketiye derve dest  n xwe şwistin    şeqil j   c  , hing   w   ci bike? Ew   bil  teke din bist  ne.



Piyadeyne ingiliz   xwe dane ber h  şa langek      qesta neyar dikin.

NEÇİREKE PILINGAN

Zabitekf fransiz wextê ko fransiz nû li Hindistanê çû bûn digel mîrefti Hindistanê çû bû nêçra pilingan. Wî zabitî qala wê nêçrê kirîye û gotiye:

Ez nikarim ji we re bidim zanîn roja ko mehracê ez ezmândim nêçfreke pilingan ez çigas kêfxwêş bû bûm. Ma kî ji tiştîkî holê kêfxwêş nabit.

Ji sê çar mehan de di dora erdêne mehracê de du piling peyda bû bûn, mî û nêr, û gelek xerabî tê de kiri bûn. Emê biçîwan nêçra wan. Wan pilingan ji dewaran pê ve du zarokên hindî ji kuştî bûn.

Piling di daristanekî bi teqan de disekinîn; çemeki şeylo ji di daristanê re diborî.

Bi mehracê re gelek xulam û çend filên fêris hebûn; filên ko gelek caran ev nêçrî kiri bûn. Xulam tev de li fflan siwar bû bûn, ji sisîyan pê ve, yêñ ko bi me re dê bimana.

Plana mehracê ev bû: Hêlevanî wê bike-tana daristanê û piling bi ser me de bajota-na. Mehrace bi xwe jî li fîleki siwar bû bû; dixwest ko ez jî pê re siwar bibim. Lê min ji xwe re çêtir dit 'ko digel hespê xwe li biwara dehban bisekinim.


Hêlevanî digel filên xwe qor girtin, daristan li xwe ba dan, li me zivirin û dehbe bi ser me de xira dikirin. Ez ji hespê xwe peya bû bûm. Min hespê xwe ji xwe re kiri bû talde, tişfingbidest li hêviyê dimam. Xulamekî serê hespê min digit.

Min digot qey geleki dom kiriye. Ji ber ko me tiştek ne dibihîst, ne jî tiştîk didît. Rojeke germ jî bilind bû bû û qehşî serê me dişgewitand. Min çavên xwe li dorê gerand tu tiştî nîn bû ko min xwe bîdaya ber siha wî.

Ez di van texmînan de bûm ko min dengê hêlevaniyan kir. Min çavên xwe vekirin û guhêñ xwe bel kirin. Nema bi germiya rojê dihesiyam. Pîstî bihinekê tevger dest pê kir. Dehbeyin jî teqanê radibûn û ji ber hêlevaniyan baz didan. Lê -kesf guh ne dida wan. Herkes li hêviyâ pilingan bû. İcar deng û pejin bêtir dibûn. Min digot edî nfzing bûye. Keriyeç meymûn ji daristanê derket û li darine perekende belay bû. Timsahêk jî ji teqanê derket û xwe berda cêm. Marekî fêris dişeliha û xwe li darekê dipêçand.

Hêj mar işe xwe temam ne kiri bû. Ez ci bibînim, her du pilingan xuya kir. È nêr da bû pşîyié. Fflan jî nfzingî li wan kiri bû û didan pey. Qırın bi hêlevaniyan ket bû. Pilingan pişti ko li pêş û paşê xwe nîhîrtin, berê xwe dane min. Dilê min hiltavet, bi

SKOÇLAND



Yek ji eyaletê Ingilistânê ên tîvel Skoçland e. Skoçland dikeve bakurê Ingilistânê. Skoçland wela-tekî çiâyîn e, xelkê wê hişk û şerâdfî ne. Hetanî iro di nav wande rézîkên eşîran hene. Xelk digin ber pez û qîmaşen wan ên hîrî di hemî dînyayê de bi nav û deng in. Xelk di cejin û sahînetan de cilên xwe ên mili wendigirin û pê iftixar dîkin. Herçî müsîqiya wan a mili, wek ya me, texlitek dahol û zirne ye. Dostê me è delal û hêja kulinê Elfinston ji wi welatê çiâyîn û eşîrwari ye. Ji xwe heye ko ji lewre dostê me ye. Klîşa me yekî skoç bi cilên xwe ên mili şanî dide.

teptepa dilê xwe dihesiyam. Lê ez li xwe hakim bûm.

Pilingan dudili ne kir. È nêr bera min da. Bi derbekê hespê min û xulamê ko ew digirt avetiñ erdê û qesta min kir. Min tifinga xwe lê rast kiri bû û nîşana xwe girti bû. Di navbera me de du gav ne ma bûn. Ez li ser çong û nîveki rûnişti, min agir kir. Orîn bi pilingî ket û li erdê pehin bû. Min hingafte bû dilê wî.

Di tifinga min de hêj berîkê hebû. A mî dirêjî min dikir. Lê min ne dizanî gelo minê wê jî holê bi rahettî bikariya bikuşta. Aylimek ji ser pişta fflan çû. A mî jî ket erdê, çermê wê bû bû bêjing ». **DILAWER ÇARPINE**

BI XWEDI KIRINA GA Ù ÇELEKAN

MASİYÊ BRAŞTÎ

Melika Misirê Kléopatre, digel aşiqê xwe Mark Antonî, carina diçû masivaniyê. Kléopatre di masivaniyê de gelek desibikér bû, hergav selika xwe ji masiyan tijî dikur.

Hercî Antonî, généralê romanî, hergav destvala vedişeriga û gelek dîgehîri. Antonî rabû xewasek peyda kir, gelek pere dan-ê; cih û roj ji jê re bi nav kîru.

Xewas di raja xwe de bi setikek masî çû û noqî avê bû. Antongo û Kléopatre halin, nehkîn xwe berdan avê. Garê ko Antongo nehkî xwe berdida xewas masiyek pô ve dikur.

Wê rojê Antongo selika xwe ji masiyan teji kir û kékîxwes bû. Heçî Kléopatre li vî işî hineki hevîr ma bû. Lô melika jîr zûka deka aşiqê xwe bir bir.

Piştî çend rojan disa çün masiyan. Dema gîhaştin geraxî avê Antongo nehkî xwe berda avê. Nehkî giran bû bû. Antongo di dilê xwe de digot, mîrikî min vê carê masiki fîris pê ve kurye; û bi kékîxwesi dîkışand.

Lê ci bibînû, bi nehkî Antongo ve masiki di firnê deş sorkuri hebû. Antongo ji serman wek masiye xwe sor bû bû.

Belê, Kléopatre piştî ko bi deka aşiqê xwe hesuya bû xewasekî din peyda kiri bû û masiki brasî da bû-yê da ko bi nehkî Antongo ve bike. Wi ji welê kiri bû.

EFSANEHÊJ



Li Ewropayê gelek guh didin bixwedikirina her texlit heywanan, ci pez ci dewarên stûr. Bi vi awayî carina pezeki wan dîgehe sed kiloyî. Dûvîn wan



pezan dibirin û xurtiyê didin bedena wan. Hercî ga ew ji digehin 800-1000 kiloyî; jidevehêne me meztir û girantir. Klişeyen me du conegeyên Ingîlistanê şanî didin.

Kiriyariya Ronahiyê

Ji bo Sûriyê Pênc lîreyên sùri — Ji bo welatên din lîrekî ingilizi

*Xwedi û gerînendeyê berpîrsîyar : Celadet Aâli Bedir-Xan. Şam—Sûriye
Directeur Propriétaire: Djeladet Aâli Bedir-Khan. Damas—Syrie*